

# KÜRDOLOJİ

## AKADEMİK ÇALIŞMALAR

DR. HASAN KARACAN

3.  
CİLT



KÜRDOLOJİ AKADEMİK ÇALIŞMALARINI 3. CİLT

DR. HASAN KARACAN



www.tiydem.com  
www.senalkitap.com

ISBN 978-605-9512-03-9



9 786059 512039

# KÜRDOLÖJİ

AKADEMİK ÇALIŞMALAR

DR. HASAN KARACAN

CİLT 3

KÜRDOLOJİ

AKADEMİK ÇALIŞMALAR

CİLT: 3

EDİTÖR

Dr. Hasan KARACAN

Editör Notu: Yazıların her tür sorumluluğu yazarlarına aittir.

ISBN: 978-605-9512-03-9

TİYDEM YAYINCILIK

[www.tiydem.com](http://www.tiydem.com)

Ekim 2017

## İÇİNDEKİLER

<b>ÖN SÖZ .....</b>	<b>5</b>
<b>Türk ve Kürt Dillerinin Sentaks (Sözdizimsel) Karşılaştırması</b> <b>Hasan KARACAN &amp; Mehmet Veysi BABAYİĞİT .....</b>	<b>7</b>
<b>Türkiye-Irak Arasındaki Sınır Ticaretinin Toplumsal, Siyasal ve Ekonomik Etkileri</b> <b>Yrd. Doç. Dr. Hüseyin ŞEYHANLIOĞLU .....</b>	<b>32</b>
<b>‘Gılgamış’ın Kürtçe Analizi</b> <b>Vehbi TUNÇ .....</b>	<b>49</b>
<b>Başarısız Bir Tepeden İnme Barış İnşa Süreci: Çatışma Çözümü Bağlamında Türkiye’nin Kürt Barış Süreci</b> <b>Ferda FAHRİOĞLU AKIN .....</b>	<b>71</b>
<b>Jiyana Elî Herîrî û Vekolînên Xebatên Wî</b> <b>Arafat YAZ.....</b>	<b>84</b>
<b>Kürtçe Öğretmek Amacıyla Hazırlanmış Android Uygulamaların İşlevselliği</b> <b>Faruk AKSOY, Nurullah AYKAÇ .....</b>	<b>130</b>

<b>Kürtlerin Klasik ve Modern Dönem Kimliğinin Oluşumunda Selahaddin Eyyubi'nin Tuttuğu Işık</b>	
<b>Gülistan ÇOBAN EMİNOĞLU .....</b>	<b>139</b>
<b>Rola Medreseyên Kurdan Di Perwerdehiya Bi Kurdî De Kürt Medreselerinin Kürtçe Eğitimdeki Rolü</b>	
<b>Nevzat EMİNOĞLU .....</b>	<b>152</b>
<b>Li Gor Kataloga Antî Aarne-Stîth Thompson Senifandina Çîrokên Gelêrî Yê Di Weşanên Hawar, Ronahî, Roja Nû û Stêrê De</b>	
<b>Ruken ÇALIŞTIRAN .....</b>	<b>164</b>
<b>Teqrîz û Teqrîza Xelîfe Yûsif Di Wêjeya Kurdî Ya Klasîk De</b>	
<b>Hasan AKBOĞA Ömer DELİKAYA .....</b>	<b>196</b>
<b>Pirsgirekên Metodolojiya Lêkolîna Kurdolojî</b>	
<b>Avdo KARATAŞ .....</b>	<b>206</b>
<b>Turkish Language policy and its impact on Kurdish (1923 to 1991)</b>	
<b>Yuksel GONUL .....</b>	<b>229</b>

# JIYANA ELÎ HERÎRÎ Û VEKOLÎNÊN XEBATÊN WÎ

ARAFAT YAZ\*

## Abstract

*In this study many writings which are about Alî Harîrî, who is known to be the first poet of Kurdish history, have been gathered and evaluated. There are various rumours about Alî Harîrî's birtdate and birtplace in the sources. All these rumours have been collected and tried to reach a true result.*

*The poems which are said to belong to Ali Harîrî have been gathered, too. And these poems from different sources have been compared with each other. In this study we have come across with a book in which there are is a poem named " Qewlê Hespê Reş ( Borê Qer)". Alî Harîrî's name was written below this piece and this gave us a new view.*

*As a whole, all the information about Alî Harîrî has been to gathered, compared and evaluated.*

## Özet

*Bu çalışmamızda Kürt tarihinin ilk şairi olduğu söylenen Alî Harîrî'nin hakkında yazılanlar bir araya getirilerek değerlendirilmeye çalışılmıştır. Alî Harîrî'nin doğum tarihi, doğum yeri hakkında kaynaklarda değişik rivayetler yer almaktadır. Bu rivayetler bir araya getirilerek doğru bir sonuca varılmaya çalışılmıştır.*

*Alî Harîrî'ye ait olduğu söylenen şiirler de bir araya toplanmış ve değişik kaynaklardaki bu şiirler birbirleriyle karşılaştırılmıştır. Bu çalışmamızda rastladığımız bir kitapta " Qewlê Hespê Reş ( Borê Qer)" adlı eserin altında Alî Harîrî'nin isminin yazılı olması bizim için yeni bir bilgi olmuştur.*

*Bütün olarak bu çalışmamızda Alî Harîrî hakkındaki tüm bilgilere ulaşılmaya çalışılmış, bunlar bir araya getirilerek karşılaştırılmış ve değerlendirilmiştir.*

## DESTPÊK

Kurmancî û mijarên Kurmancî beyar in. Ji ber ku zimanê Kurmancî neketiye zanîngeha û di warê akademiye de cih negirtiye, mijarên Kurmancî nehatine ajotin û hê tu xebat li ser van mijaran nehatine kirin. Ji ber ku beşa mina lîsansê dîrok e û di ser lîsansek din de jî ez li ser mijarên dîrokê xebitîbûm, min xwest ku ez vê beşê bidomînim.

Derbarê ‘Elî Herîrî de gelek agahiyên nivîskî hene lê dema mirov van agahiyan dikole, mirov dibîne ku ev agahî, ji çend çavkaniyan belav bûne. Ê ku van agahiyan girtine, wan şîrove kirine lê ji wê pê de her tişt li nav hev ketiye. Ji ber ku ji destê ‘Elî Herîrî, tişteki wî bi zelalî bide nîşandan nemaye û bi qandî agahiyên nivîskî ewqas jî gotegot hene û ev nivîs û gotegot li hev nanêrin alozî zêde bûye. Ji ber vê yekê min xwest ku bikevim nava vê geremolê û hinek tişt ji hev biqetînim. Eger ji hev neqetînim jî, ji agahiyên di derbarê ‘Elî Herîrî de wek wênekî ku ji hev belav bûbe digel kêmasî û şolîtiya, ji bo ku tişteki bi wate jê derê, bi qederê gengaziyê bigînim hev û nêzî ber çavên xendevanan bikim.

Taybetiyên ‘Elî Herîrî vê mijara ha girîng dikin. Li gorî gotegot û agahiyên nivîskî ‘Elî Herîrî zanyarek navdar e. Ji ‘ewama bêhtir di nav xendayên Kurda de ‘Elî Herîrî tê naskirin. Pirê vekolîner û dîrokvanên Kurd û biyan, wî wekî helbestvanê yekem pejirandine. Di zanyariya ‘Elî Herîrî de jî jixwe tu guman tune.

Derbarê ‘Elî Herîrî de li Tirkiyê û li derveyê Tirkiyê hinek kolan(lêkolîn) hatine kirin. Her çiqas ji van xebatê hanî min xwe negihand hineka jî, di çavkaniyên destê me de naveroka wan hebû. Ji nav van kolaner û nivîskaran bi şîroveyên xwe, navê Abdulreqîb Yûsuf li serî ye. Di pirtûka xwe de wî pirê agahiyan dahûrandiye. Ji aliyekî din ê ku navê ‘Elî Herîrî kirine qada nivîsê, her wekî tê zanîn A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazidî, Albert Sosîn, Major Saone, M.B. Rûdenko, Sadiq Behaeddîn Amedî û Qanadê Kurdo ne. Ji van nivîs û nivîskaran bêhtir heta ana di nav medrese û zaniyarên Kurda de ji ber ku nav û dengê ‘Elî Herîrî nifş bi nifş hatiye guhastin bi helbestvanî û alimiya wî, ew li mertebeke herî jor e.

## 1. BEŞA YEKEM: JIYANA ‘ELÎ HERÎRÎ

### 1.1.NETEWA WÎ:

Di belgeyên nivîskî de li ser pirsê ku ‘Elî Herîrî Kurmanc e an jî Soran e gotegotên cihêreng hene. Hinek ji wan dibêjin ku ‘Elî Herîrî Soran e. Yek ji wan kesanjî Kamûran Bedirxan e. Prof. Qanatê Kurdo dibê ku : “Kamûran Bedirxan di nivîsara xwe de ya bi navê *Fêrbûna Xwendina Zimanê Kurdî* (Parîs, 1968, r.42) nivîsiye ku ‘Elî Herîrî Soran e.” Di dû re ji ber ku Kamûran Bedirxan di nivîsara xwe de bi Soranî an jî bi Kurmancî tu helbestên ‘Elî Herîrî çap nekiriye wî rexne dike.<sup>1</sup> Bi vê gotina xwe Prof. Qanatê Kurdo li ber angaştê Kamûran Bedirxan nerazîbûna xwe aşkere dike.

Di kovara Hewarê de jî Herekol Azîzan bi navê *Klasîkên Me An Şahir û Edîbên Me Ên Kevinnivîsekî* weşandiye. Di vê nivîsê de li ser netewa ‘Elî Herîrî wiha tê gotin: “Li gora ku me bihîstiye gundê wî Herîr di welatê Soran de ye û ‘Elî Herîrî bi xwe Sorî ye”<sup>2</sup> Herekol Azîzan (Celadet Bedirxan) û Kamûran Bedirxan ji ber ku ji heman malbatêne loma her dû jî heman tiştî anîne ser zimên. Lê kêmasiya her dûyan jî ev e ku di destê wan de tu belgeyek tune lê her wekî em dizanin gelek kes dibêjin ku ‘Elî Herîrî Kurmanc e û helbestên wî yên bi Kurmancî hatine weşandin. Her çî qas pir kes behsa dîwana wî dikin jî lê di dû re dibêjin ku ev dîwan di destên kesî de tune ye. Ji xeynî viya tu berhemên ‘Elî Herîrî ku bi zaravayê Soranî hatibin weşandin tune ne. Abdulreqîb Yûsif vê angaştê teyîd dike û dibêje: “Helbestên wî bi lehca Kurmancî hatine nivîsandin, bi lehca Soranî nenivîsiye.”<sup>3</sup>Wekî Zeynelabîdîn Zinar<sup>4</sup> gelek vekolîner û nivîskar jî dibêjin ku ‘Elî Herîrî bi zaravayê Kurmancî nivîsandiye. Ji vana yek jî Feqî Huseyin Sağniç e. Feqî Huseyîn Sağniç li ser vê nîqaşê wiha şîroveyan dike: “‘Elî Herîrî Kurmanc e. Her çî qas hinek mirov, “Herîrî Soran e” dibêjin lê ev yek nerast e. Her çiqas îro li bajarokê Herîrê, zaravayê Soranî digel Kurmancî tê bikaranîn û bajarok jî di sînorê Kurmanc û Soranan de ye jî lê di salên ku Herîrî tê de jiyaye heta sedsalên li dû wê jî zaravayê Soranî, li wî bajarokî nehatiye xebitandin. Jixwe di dema jîna Herîrî de bi zaravayê Soranî hêj helbest nehatine nivîsandin û helbestvan jî ji wan ranebûne. Çawa hatiye pejirandin ku helbestvanê Soran ê pêşî nêzîkê dema Nalî ye û wefata wî

<sup>1</sup> Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Özge, Enqere,1992, r.57

<sup>2</sup> Herekol Azîzan, Kovara Hewarê, Weşanxana Nûdem, Cild 2, Stokholm, 1988,r. 811

<sup>3</sup> Abdulreqîb Yûsuf, *Şairên Klasîk ên Kurd*, Weşanên Jîna Nû, Sweden,1988, r.13

<sup>4</sup> Zeynelabîdîn Zinar, *Nimûne: Ji Gencîneya Çanda Qedexkirî*, Weşanxane tune,Swedan,1991,r.29



zâtî bi qasî sed û pêncî sal berî roja me ye. Yek jî, tu kes saloxê helbestên Herîrî yê ku bi Soranî hatine nivîsandin nadin, an jî em pê gumandar nebûne. Heta ew ê ku vê angaşte dibêjin jî nizanin nexwe ev yek ji ku derketiye û mebest jê çi ye.”<sup>5</sup>

Bi rastî ev pirsgirêk bi pirsgirêkeka dinê ve girêdayî ye. Di çavkaniyan de behsa sê Herîran tê kirin. Yek ji van Herîran, Herîra Hewlêrê ye û ji ber ku di tixûbê Kurmanc û Soranan de ye ev bûye sedema gumanê. Lê li gorî fikra min ji ber ku tiştên ji ‘Elî Herîrî mane tev bi Kurmancî ne û di nav Kurdan de qenaet heye ku ‘Elî Herîrî Kurmanc e êdî ne hewceye mirov li dû gumanan here.

## 1.2.DÎROKA JIDAYÎKBÛNA WÎ

Li ser sala wîladeta ‘Elî Herîrî gelek alozî heye. Her yek dîrokvan û lêkolînerêkî tişteke gotiye. Ev mijar bi gotegot û şiroveyan ewqasa li nav hev ketiye ku êdî zelalkirina vê pirsgirêkê dijwar bûye.

Çima li ser diroka jiyana ‘Elî Herîrî ewqas nîqaş heye? Bi min ev pirs ha pir girîng e. ‘Elî Herîrî bi çawaniyek wisa tê wesifkirin kû di dîroka Kurmancî de mijareke girîng e. Gelek kes gotine ku ‘Elî Herîrî yekem helbestvanê zaravaye Kurmancî ye. Ev jî ji ber dîroka zayîna wî ye ku dibêjin di sala 1009ê zayînî de jidayîk bûye. Ku ev gotegot rast derneyê wê ew wesfê ‘Elî Herîrî jê bê sitendin. Ê ku jidayikbûna wî herî bi paş dixê Abdulreqîb Yûsuf e lê li gorî wî dîsa ew ji Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran mezintir e.<sup>6</sup>

Yek ji girîngiya vê mijarê ev e ku bi xêra van helbestvana, zimanê Kurmancî heta niha zindî maye. Em di jiyana xwe de dibînin ku Mewlûdê çî bandorekî li ser kevneşopa Kurmancan kiriye. Mewlûd stîlekî xwendinê ji xwe re çê kiriye û bûye rîtuelekî ji bo şîn û şahiyên, pîrozbahiyên û ji bo rûmetnîşandana cenabê Pêxember. Dîroka Mewlûdê jî (jiyana Melayê Batê 1417- 1491)<sup>7</sup> forsa zimanê Kurmacî ye. Ji aliyekî din kî ku di medreseyan Kurdan de dest bi helbestvaniyê kiribe wisa xuya ye ku ev tevger bûye mînak ji bo ê di dû xwe re. Di temamê dîrokê de ev kevneşopî domiyaye. Di nîfşên nêzî me de jî seydayên medreseyan Kurdan helbestan nivîsandine.

<sup>5</sup> Feqî Huseyîn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstitûya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1922, r.364

<sup>6</sup> Yûsuf, r.15

<sup>7</sup> Abdulkadir Turan; *Ümmetin Bir Azası Olarak Kürtlerde İslamî Kimliğin Gelişmesi*”Weşanên Dua, Stenbol 2011, r. 142

Ez bixwe dizanim ku hem aliyê herêma Farqînê Seyda Mele Yasîn Yusrî, Seyda Mele‘Eliyê Zîla, Seyda Mele Se’îdê Taxikî ku her yek ji van pênsên wan ji aliyê wêjeyê ve wek Zulfîqarê ‘Elî tûj in. Ev nîşan dide ku di dîrokê de gelek melayên me yên wiha hebûne lê ji ber ku di warê fermî de zimanê Kurdî tunebûye ev xebatên wan di nav pelên dîrokê de winda bûne.

Li ser vê mijara jidayîkbûna ‘Elî Herîrî kesê yekem ku xebitîye û nivisandîye Alexandre Jaba ye û li gorî wî ‘Elî Herîrî di nav salên 1009 û 1078-79ên mîladî de jiyaye.<sup>8</sup>Lê di pirtûkeka dinê de R.Khanam dibê ku Jaba gotîye ‘Elî Herîrî di nav salên 1425 û 1495an de jiyaye.<sup>9</sup>Mîrov gava li pirtûkên nivîskarên biyan dinêre mîrov hinek agahiyên wiha xelet dibîne. Jixwe ez bawerim ku dema van agahiyên ji hev girtine xeletiyên kirine û hinekan sala koçî û sala mîladî li nav hev xistiye.Thomas Boîs jî vê dîrokê 1426-1495 nivisandîye.<sup>10</sup>Dîsa Th. Boîs bi V.Mînorsky û D. N. Mc Kenzie re di pirtûkeka dinê de gotine ku: “ Jaba dibê ku helbestvanên pêşîn di sedsala pazdehem de jiyane. ‘Elî Herîrî sala 1425-1495...”<sup>11</sup>

Pirtûka “Kürt Dili ve Edebiyatı” xwe disipêre gotinê Mînorsky û dibê ‘Elî Herîrî di nav salên 1010 û 1078an de jiyaye.<sup>12</sup>

Wêjekarê dema me Mehmet Êzûnî li ser dîroka wêjeya Kurdî xebat kiriye. Hem li ser wêjeya Kurdî lêkolînerî kiriye hem jî nivîskarî kiriye. Mehmet Uzûnî jî dîroka jiyana ‘Elî Herîrî di nav salên 1425-1490? de nîşan daye lê wekî ku li dawîya dîrokê xuya ye pirsênîşanekî daniye. Aşîkar e ku ew ji gumanan pak nebûye.<sup>13</sup>

Zekî Bozarslan di nivîsarên xwe de piştî xwe bi Mele Mehmûdê Bazidî girê dide û dibêje ku Mele Mehmûdê Bazidî navê heşt helbestvanên Kurd bi rêz kiriye û dema jiyana ‘Elî Herîrî 1010 û 1078ê mîladî nîşan daye.<sup>14</sup>

Dîrokvan Mehmet Emîn Zekî li ser ‘Elî Herîrî bi kurtasî agahî daye û gotîye ku ‘Elî Herîrî di nav salên 1010-1079an de jiyaye û herîrî hemdemê Fîrdewsiyê xwediyê

<sup>8</sup> Jaba, r.27

<sup>9</sup> R. Khanam, *Encyclopaedic Ethnography of Middle-East and Central Asia*, New Delhî, Îndia,2005 Volume1,A-I,r.501

<sup>10</sup> Thomas Boîs, *The Kurds*, Hayats,Beîrut,1966,r.123

<sup>11</sup> V.Mînorsky, Th.Boîs, D.N. Mc. Kenzie, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Doz, Stenbol, 2004, r.176

<sup>12</sup> Mehmet Sait Çakar, Fehîm Işık ve diğêrleri, *Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakfı, İstanbul r. 102

<sup>13</sup> Mehmed Uzûn, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên İthakî, 2011, Stenbol, r.11

<sup>14</sup> Zekî Bozarslan, *Nêrînek Li Dîroka Kürdistanê*, Weşanên Doz, 2004, Stenbol,r.248

Şehnameyê ye.<sup>15</sup> Lê xwezî ku wî çavkaniya xwe nîşan daya lewra ev agahî ji aliyê hinek kesan ve hatiye bikaranîn.

Mehrdad R. Izady dibêje ku ‘Elî Herîrî di sala 1425an de hatiye dinyayê û di sala 1490î de rehmet kiriye.<sup>16</sup> Rojen Barnas di kovara Hêviyê de dibêje ku: “Zimanê me î nivîsanî, bi tîpên Erebî ji ‘Elî Herîrî; bi tîpên Latînî ji Celadet Bedirxan dest pê dike.”<sup>17</sup> Bi vê tespîtê dipejirîne ku ‘Elî Herîrî beriya 1414 an jî 1417 beriya Melayê Batê ye.

Zeynelabidîn Zinar piştî ku dibê: “ Yek ji helbestvanên kevintirîn û nivîskarê Kurd ‘Elî Herîrî ye. Ew di sala 1010an de li gundê Herîrê hatiye dinê û di sala 1078an de jî çûye dilovaniya xwe.” li ser rîvayêtên di der barê dîroka jiyana ‘Elî Herîrî de dest bi şîroveyan dike û hinek gotegotên dinê dinivîsîne.<sup>18</sup>

Li gorî kovara Heviya Welêt ‘Elî Herîrî di sala 1009 de hatiye dinê û di sala 1079an de gihîştiye rehmeta Xwedê.<sup>19</sup>

Ev nîqaş li ser zayina Feqiyê Teyran jî heye. M. Xalid Sadînî di pirtûka xwe de agahiyên dijî hev bi rêz dike û di nav gelek agahiyan di dawî de hizira Abdulreqîb Yûsuf dicibîne, lewra Feqiyê Teyran di helbesta xwe de gotiye ku: “Di hezar û yek û sihan”, “Hezar sal û çil û yek çûne.” Van hejmaran li gorî rojnîşa koçîhesab dike û wîladeta Feqiyê Teyran dibîne. Bi vî hesabî M. Emîn Zekî Bey, Botan Amedî, Mehmet Bayrak, Qanatê Kurdo, Mînorsky, Kovara Heviya Welêt û Kemal Burkay ku dibêjin Feqiyê Teyran di sala 1307 an jî 1375 an de jiyaye niheq derdixe.<sup>20</sup> Lê di destên me de helbesteke wisa tune ye ku em jî demajiyana ‘Elî Herîrî jê derxin.

Feqî Huseyîn Sağniç jî li ser dema jiyana Elî Herîrî agahiyan dide û şîroveyan dike. Di serê gotinên xwe de di du ciyan de behsa zanîn û delîlên destên xwe dike lê van delîlan bi me re parve nake. Feqî Huseyîn Sağniç wiha dibêje: “Wekî gelek hêja û lehengên me mixabîn dîroka jîna wî tam nayê zanîn. Ya ku ji aliyê me ve bi hinek

<sup>15</sup> Mehmet Emîn Zekî, *Kürt ve Kürdistan Ünlüleri (Meşahîr-î Kurd û Kurdistan)*, Weşanên Öz-Ge, Swedan, 1998, r.268,269

<sup>16</sup> Mehrdad R. Izady, *Kürtler-Bir El Kitabı*, Weşanên Doz, Stenbol, 2004, r.311

<sup>17</sup> Rojen Barnas, *Rastnivîsîna Kurdî*, Kovara Hêvî, Hejmara Yekem, Parîs-Fransa, 1983, r.23

<sup>18</sup> Zinar, r.28

<sup>19</sup> Hemreş Reşo, “*Kronolojiya Nivîskarên Kurd li Kurdistanê Bakûr*” Paris Kürt Enstitüsü, Kovara Hêviya Welêt, Paris 1976, Paris, r.7

<sup>20</sup> M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2002, r.40

delîlan û hezran tê zanîn ev e Herîrî ji her du hozanên me (Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran) bi temenê xwe mezintir e ango beriya wan hatiye cîhanê û ji cîhanê koçdawî kiriye. Wisa tê zanîn ku jîna wî di dawiya sedsala 15an û serê sedsala 16an de bûye. Lê ji kîjan sedsalê çiqas hilaniye tam nayê zanîn. Çawa jidayikbûna wî teqez nayê zanîn koçdawiya wî jî wisa ye.”<sup>21</sup>

Li ser dîroka ji dayikbûna ‘Elî Herîrî, Abdulreqîb Yûsuf gelek şîroveyên balkêş kiriye. Ku em angaşten Abdulreqîb Yûsuf bipejirînin gere em hinek agahiyên xwe yî giring biguherînin. Wî, dema jiyana ‘Elî Herîrî nû kiriye lê pê re dema jiyana Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran jî nû kiriye. Lewra di şîroveyên xwe de dibêje: “Ne dûre di navbera mirina ‘Elî Herîrî û jidayikbûna Ehmedê Xanî de li dora 50 sal hebe.”<sup>22</sup> Ehmedê Xanî di sala 1650-51an de jidayik bûye. Li ser vî hesabî mirina ‘Elî Herîrî dibe 1600. Wekî ku li jorê me nivîsiye temenê ‘Elî Herîrî di dora heftêyî de hatiye qeydkirin. Piştî vana, mirov li ser hesabê Abdulreqîb Yûsuf dikare bibêje ku ‘Elî Herîrî di dewra 1530an de jidayikbûye. Angaşteke din a Abdulreqîb Yûsuf jî ev e: “Feqî di sala 1041ê hicrî de û Mela di 1031ê hicrî de sax bûne.”<sup>23</sup> Dema mirov li çavkaniyan dinêre li ser jidayikbûna Melayê Cizîrî jî her lêkolîner û dîrokvanekî tiştêkî gotiye. Qanatê Kurdo li ser jidayikbûna Melayê Cizîrî jî wan çend heba wiha dijimêre. A.Jaba gotiye di sala 1556an Mela miriye, A.Seccadî 1407-81, D.N. Mc Kenzîe 1570-1640, M.B. Rûdenko 1101-1169.<sup>24</sup> Prof. Dr. Abdulbaqî Tûran bi hesabê ebcêdê jidayikbûna Melayê Cizîrî 1567-68 dibîne.<sup>25</sup> Her wisa bi hesabê ebcêdê Zeynelabidin Kaya û M.Emin Narozi sala 1570yî dîtine.<sup>26</sup> Bi rastî rêbaza Prof. Dr. Abdulbaqî Tûran û M. Xalid Sadîni rast e û bi cih e, gere li ser mijara jidayikbûna Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran êdî nîqaş neyê kirin û ev çespê han jî aliyê her kesî ve bên pejirandin. Abdulreqîb Yûsuf rasrerast di pirtûka xwe de nabêje lê ji nivîsên wî aşîkar e ku ew jî vî hesabî dike.

Bedîrxan Amedî jî bi hesabê ebcêdê dîroka nivîsandina berhema Siyahpoş dibîne. Bi dubendiya Siyahpoş ku ew dibêje:

“Bi dil wî Şahê ‘Asim yek xezel xoş

---

<sup>21</sup> Sağniç, r.366

<sup>22</sup> Yûsuf, r.15

<sup>23</sup> Yûsuf, r.15

<sup>24</sup> Kurdo, r.90

<sup>25</sup> Abdulbaqî Tûran, *Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2010, r.17

<sup>26</sup> Zeynelabidin Kaya, M.Emin Narozi; *Melayê Cizîrî-Dîwan*, Weşanên Roja Nu, Stokholm/Swedan, 1987, r.21

Reqem da ‘aşiqê bidil Siyahpoş’

1820ê mîladî dibîne û dibêje: “Lê her wekî bi pirranî berhemên şairên girêdayîyên terîqetên tesewwîfî de diyar dibe hindek şair hindek tarîxan gellek xweş di berhemên xwe de vedişêrin.”<sup>27</sup>

Me got ku li gorî hesabê Abdulreqîb Yûsuf mirina ‘Elî Herîrî 1600 e. Bi vê çespê ‘Elî Herîrî, Melayê Cezerî û Feqiyê Teyran dibin hemdemê hev. Abdurreqîb Yûsuf viya tîne ziman: “Dema em van hemûyan bigrin ber çav, em dikarin bigîhjin wê genaeta han ku kurê ‘Elî Herîrî li gora temenê xwe wek Mela û Feqî ye.” “Diyar e ku ‘Elî Herîrî pêşiya Mele Ehmedê Cizîrî helbest daniye û navê wî bi helbestgotinê belav bûye.”<sup>28</sup>

Abdulreqîb Yûsuf vê angaştê xwe bi çavakaniyek dîrokî zexm dike. Wiha dibêje: “Dîrokvan Muhibbî di kitêba xwe ya bi navê Xulasetu'l-Eser(C.I'e di rûpela 248'an) de nivîsiye, dibeje: “Şêx Ehmed, kurê Elî Herîrî ye, bave wî Kurd e û xelkê bajarê Herîre ye. Elî Herîrî hatiye welatê Şame, li gunde ‘Isa(nezîkî Şamê) bi cî bûye. Ehmede kure wî li gunde 'Isa ji dayikaxwe bûye. Ehmed di zarotiya xwe de çûye Şame û li wirxwendiyê.” Di dû re dibê Muhîbbî gotiye ku Şêx Ehmed di sala 1048ê hicrî (1638ê mîladî) de miriye.<sup>29</sup> Dîrokvan Muhibbî sêzdeh sal piştî mirina Şêx Ehmed hatiye dinê.<sup>30</sup>

Di vê mijare de tişteki dinê heye ku gere mirov li serê bisekine. Ew jî eve ku dibetiya lihevketina dîroka mîladî û dîroka koçî ye. Lewra bi piranî ji bo jidayîkbûna ‘Elî Herîrî sala mîladiya 1009 û 1010an didin. Gava mirov bêje vê dîrokê dîroka koçî bûye û bi xeletî mîladi hatiye hesibandin ev car dîroka 1600î dertê hemberî mirov. Me gotibû ku li gorî hesabê Abdulreqîb Yûsuf sala 1600î sala mirina ‘Elî Herîrî ye. Ku ev dîrok rastî sala mirina ‘Elî Herîrî nehata û rastî sala jidayîkbûna ‘Elî Herîrî bihata em ê bi vê yekê teqez bawer bibûna. Dîsa jî mirov gere vê dibêtiyê navêje pişt guhên xwe.

Di kovara Heviya Welêt de dibêje ku: “ Di dema wî de Merwanî karbidestên welêt bûn û Diyarbekir ji xwe re kiribûn serekbajar.”<sup>31</sup> Lê Herîra Hewlêrê û Merwanî dûrê hev in. Di çavkaniyên me de jî behsa jiyana ‘Elî Herîrî li Şamê tê kirin. Çawa ku

<sup>27</sup> Bedirxan Amedî, Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal Siyahpoş, Weşanên Nubihar, Stenbol, 2011, r.6

<sup>28</sup> Yûsuf, r.15

<sup>29</sup> Yûsuf, r.14

<sup>30</sup> Nevîn Karabela, Muhibbî ve “Ma Yu'avvel ‘aleyh fi'l-Mûzafve'l-Muzaf İleyh” Adlı Eseri, [http://turkoloji.cu.edu.tr/ESKI%20TURK%20%20EDEBIYATI/nevin\\_karabela\\_muhibbi.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/ESKI%20TURK%20%20EDEBIYATI/nevin_karabela_muhibbi.pdf)

<sup>31</sup> Zinar, r.28

Abdureqîb Yûsuf behsa çûndina wî bi Şamê dike<sup>32</sup> Feqî Huseyîn Sağniç dibêje ku di nîvtemeniya xwe de derbasî Şamê bûye û li gundê Esali rûniştiye.<sup>33</sup>

Abdulreqîb Yûsuf behsa tişteki dinê dike ku pêwist e ku mirov binivîse. Wiha nivisandiyê: “Her wiha bi Kurmancî kitêb jê hat hûnandin ji bal hinek zanayên Kurd ên wek Elî Teremaxî ku di kîtabên wek Tarîxa Kurd û Kurdistan û Daîretü’l-Mearîfü’l-Îslamiye de wek Elî Termûkî hatiye nivisîn û hatiye gotin ku di çerxa çarê hicrî de jiyaye. Lê Merdûxî di kîtaba bi navê Dîroka Kurd û Kurdistan di rûpela 94an de dibêje ku Elî Termûkî di sala 1000ê hicrî de ji dayika xwe bûye û di sala 1065an de ji koça dawî kiriye.”<sup>34</sup> Di vê nivîsê de xeletiyên dîrokvanan bala mirov dikişîne. Tevî vêya dîroka 1000 û 1065 dişibe dîroka jidayikbûna ‘Elî Herîrî. Dibe ku hinekan agahiyên Elî Herîrî û ‘Elî Teremaxî li nav hev xistibin.

Di pirtûka Qanatê Kurdo de ku helbestên ‘Elî Herîrî, ji nivîsê Sadiq Bahaeddîn Amedî girtiye çareka wiha heye:

Dîdara te ez Zîn kem

Heta kengê ruh te teng kem

Keser bûm carekê bîn kem

Xudana têt û desmalê<sup>35</sup>

Di vê çarekê de peyva Zîn ku bi qesda Zînê be dîroka mîladî ya 1009 an jî 1010 negengaz e ku dîroka jidayikbûna ‘Elî Herîrî be. An jî agahiyên ku di der barê Mem û Zîn de em dizanin ji aliyê dîrokî de xelet in. Jixwe kesê ku dîroka vê destanê bi pêş ve dibin jî hene. Tew hinek dibêjin ku ev destan mîtolojîk e û beriya zayinê jî di nav Kurdan de hatiye gotin.<sup>36</sup>

Piştî van agahiyan em ê bêjin çi? ‘Elî Herîrî kîngê hatiye gerdûnê û helbestvanê yekem ew e an na? Abdulreqîb Yûsuf bi şîroveyên xwe jidayikbûna ‘Elî Herîrî ber bi sala 1530an ve bir. Ê li gorî ramana wî ‘Elî Herîrî û Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran

---

<sup>32</sup> Yûsuf, r.15

<sup>33</sup> Sağniç, r.366

<sup>34</sup> Yûsuf, r.20

<sup>35</sup> Kurdo, r.62

<sup>36</sup> Ehmedî Xanî, Türkçesi M.E.Bozarslan, Mem û Zîn, Weşanên Gün, Stenbol,1968, r.13

hemdemê hev in. Li gorî ku ew dibêjê, wek bav û kurekî ‘Elî Herîrî ji Melayê Cizîrî mezintir e.<sup>37</sup> Em dizanin ku têkiliyê Mela û Feqî bi hev re hene û tew em dikarin bi berhemên wan, wan nas bikin. Hemin ku hemdemê hev in û ‘Elî Herîrî wek ustadê wan e çima wan behsa ‘Elî Herîrî nekirine? Ku bi hev re jiyabûna gere Mela û Feqî ji wî haydar bûna û behsa wî bikirina. Ev pirs me bi sê aliyan ve dibe. An gere mirov bibêje erdnîgariya ku tê de jiyana dûrî hev bûne an ‘Elî Herîrî pir beriya wan jiyaye an jî ‘Elî Herîrî hem pir beriya wan jiyaye û hem jî erdnîgariya ku tê de jiyane dûrî hev bûne. Di dîrokê de rêç û angaştekî ku bibêje ‘Elî Herîrî piştî Melayê Cizîrî jiyaye tune ye, ji ber vê em li ser vê dibetiyê nasekinin. Bi fikra min hem ‘Elî Herîrî pir beriya wan jiyaye hem jî erdnîgariya ku lê jiyaye dûrî wan bûye. Jixwe me behsa mayîna wî ya li Herîra Hewlêrê, Şamê û tew em ê behsa dibetiyê ku çûbe Misrê jî bikin.

Kesê ku pêşî behsa ‘Elî Herîrî kiriye Alexandre Jaba ye û ev dîrok dîrokeke kevn e. Ew û Mele Mehmûdê Bazidî zêdeyî sed û pêncî sal berê li ser van mijara lêkolînan kirine. Bi fikra min ji ber ku delîlekî zexm tune ku ‘Elî Herîrî di salên 1530î de hatiye dinê, gere mirov gotina Alexandre Jaba û Mele Mehmûdê Bazidî bipejirîne. Dibe ku di dema wan de ev mijar zelaltir bûbe. Ji ber ku Agahiyên Alexandre Jaba û Mele Mehmûdê Bazidî bi lêkolînan girêdayî ne û qewlê wan, ê kevntirîn e gere mirov dîroka ku ew dibêjin bipejirîne.

### 1.3.CIHÊ JIDAYÎKBÛNA WÎ

Di der barê cihê ku ‘Elî Herîrî çavên xwe li gerdûnê vekiriye lêkolîneran agahiyên cihêreng tomar kirine. Dixwazim van agahiyan bitevahî nîşan bidim ku ev mijar hêsantir bê fehmê.

Alexandre Jaba dibê ku ‘Elî Herîrî li Herîra Şemzînana Colemêrgê welidiye.<sup>38</sup> Dema mirov li xebatkarê hevalê wî Mela Mehmûdê Bazidî dinihêre ew jî wek

---

<sup>37</sup> Yûsuf, r.15

<sup>38</sup> M.Alexandre Jaba, *Recueil De Notices Et Récits Kourdes*, St.Petersburg, 1860, r.27

Alexandre Jaba fikiriye û di pirtuka xwe de heman agahiyan nivisandiye.<sup>39</sup> Di pirtûka ku bi navê “Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı” hatiye amadekirin de dibê ku ‘Elî Herîrî ji Herîra Şemzînanê ye lê behsa angaşên din jî kiriye.<sup>40</sup> Li gorî Mehrdad R. Izady ‘Elî Herîrî ji Herîra nêzî Rawenduzê herêma Colemêrgê ye.<sup>41</sup> Dema mirov di Google Mapsê de dinêre Rawenduzê ji Colemêrgê bêhtir nêzî Hewlêrê ye û îro di derveyî tixûbê Tirkîyê de ye û dîrê tixûbê Tirkîyê ye. Di kovara Hêviya Welêt de jî hatiye nivîsandin ku ‘Elî Herîrî ji Herîra gundê Bêdlîsê ye.<sup>42</sup> Lê jî xeynî vê kovarê pê ve kesê ku ‘Elî Herîrî bi vî hawayî dabin naskirin tun in. Abdulreşîq Yûsuf di bersiva vê pirsê de bi şîroveya xwe rêke nû ji me re vedike: “ Ji ber ku ev gundê han li ser xeta Bahdînan (Kurmanç) û Soran e û niha jî axaftina wan bi têkilheviya Soranî û Bahdînanî ye. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku dîr nîne ‘Elî Herîrî ji cihekî din be û pişt re hatibe li Herîrê bi cih bûbe û li wir mabe.”<sup>43</sup>

Di van gotegotan de behsa sê Herîran tê kirin. Herîra Bêdlîsê, Herîra Şemzînanê û Herîra Hewlêrê. Ji ber ku bitenê di yek cih kî de behsa Herîra Bêdlîsê tê kirin û tu çavkanî nehatiye dayîn ji bo wê, mirov dikare bibêje ev qewlê ha lawaz e. Dema mirov li Herîra Hewlêrê dinêre mirov dibîne ku di nava Hewlêrê û Şemzînanê de ye. Guman ji mirov re çêdibe, mirov dibê: “Nebe ku Herîra Şemzînanê û Herîra Hewlêrê yek bin.” Jixwe ana li Şemzînanê gundêkî bi navê Herîrê tune ye. Bi navê “Nehrî” gundek heye û ev nav dişibe navê Herîrê. Piştî vê rewşê mirov dikare bibêje ku ‘Elî Herîrî ji Herîra Hewlêrê ye.

#### 1.4. DI ÇAVKANIYAN DE ŞOPÊN ‘ELÎ HERÎRÎ

Di klasîkên Kurdî de navê ‘Elî Herîrî di du cihan de derbas dibe. Berhemek ji wan, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ye. Ehmedê Xanî navê sê kesên ku di beriya wî de di nav Kurdan de bi nav û dengî jîmartiye.

#### Bîna ve rûha Melê Cizîrî

<sup>39</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, Camîeya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zîmanê Kurmançî, Amedekar Zîya Avci, Weşanên Lîs, 2010, Amed

<sup>40</sup> Mehmet Sait Çakar, Fehîm Işîk ve diğêrleri, *Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Weşanên Tarih vakfî, İstanbul, 2010, r.104

<sup>41</sup> Mehrdad R. Izady, *Kürtler-Bir El Kitabı*, Weşanên Doz, Stenbol, 2004, r.311

<sup>42</sup> Reşo, r.7

<sup>43</sup> Yûsuf, r.14



Pê hey bikira ‘Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqiyê Teyran

Hetta bi ebed bimayî heyran<sup>44</sup>

Siyahpoşê Diyarbekirî di sala 1820î de dibê qey zanibiye ku rojekî em ê li rêçê ‘Elî Herîrî bigerin û di helbesta xwe de wî nivisandiye.

Mekkî û ‘Elî Herîrî

Bên li dengê min feqîrî<sup>45</sup>

Di çavkaniyan de me dît ku dibêjin ‘Elî Herîrî çûye Şamê an jî nîvtemenê xwe li Şamê derbas kiriye. Kesî behs nekiriye lê di helbesteka ‘Elî Herîrî de behsa Misrê tê kirin.

Mehweşê ku westan sef be sef

Ew hate der Misrê tekef<sup>46</sup>

Dema mirov bibêje “ew hate der Misrê” ango “ew hate hindirê Misrê” gere mirov jî li Misrê be. Di pêşiya vê helbestê de dibêje ku “Ziman nezan û Romî ye.” Ev jî nîşan dide ku ‘Elî Herîrî li cihan geriyaye bitenê di Herîrê de nemaye û têkiliya wî û mirovên biyan çê bûne tew evîndara wî Romî ye. Ku mirov van her dû hevokan bide ber hev qenaeta mirov hinekî din jî zexm dibe ku ‘Elî Herîrî li Misrê jî mabe. Abdulreqîb Yûsuf dibê ku zanayên Kurd di wê demê de çûne Şamê, Misrê û Îraqê.<sup>47</sup> Dîsa Abdulreqîb Yûsuf dibêje ku ‘Elî Herîrî li derveyê Kurdistanê miriye û gora wî ne li welêt e.<sup>48</sup> Feqî Huseyîn Sağniç jî beşdarî vê fikrê dibe û dibêje ku gora wî ya pîroz ne li Herîrê ye.<sup>49</sup>

‘Elî Herîrî di nav Kurmanca de pir meşhûr bûye. Xwe bi yekem helbestvanê Kurmanca daye pejirandin. Wekî ku tê zanîn helbestvan Baba Tahirê Hemedanî Lorî ye

---

<sup>44</sup> Ehmedê Xanî, Memozîn, Transkripsiyon Arif Zêrevan, Nefel, 2004, r.49

<sup>45</sup> Amedî, r.7

<sup>46</sup> Yûsuf, r.26

<sup>47</sup> Yûsuf, r.14

<sup>48</sup> Zinar, r.29

<sup>49</sup> Sağniç, r.366

û Lorî jî zaravayek Kurdî ye. Baba Tahirê Hemedanî beriya ‘Elî Herîrî jiyaye. Helbestvanê zimanê Kurdî ê yekem Baba Tahirê Hemedanî ye lê ê Kurmancî jî ‘Elî Herîrî ye. Helbestên ‘Elî Herîrî di nav gelê me de bi şevan dihatin xwendin û li guhdaran gelek bandor dikirin. Gava pesnê yekî dengxweş û meqamxweş bikirina digotin “Di tanga ‘Elî Herîrî de ye.” ‘Elî Herîrî zanayekî mezin bûye. Di zanîna xwe de jî wekî hozaniya xwe li pêş bûye. Di nav gel de dema kesekî xwendinşemirandî biçûk bikirina, “Erê! Xwend û bû ‘Elî Herîrî” digotin. Şêx Ehmedê kurê wî jî zanayekî mezin bûye.<sup>50</sup>

Feqî Huseyîn Sağniç dibê ku dengê medreseyên Herîrê heta cihên dûr çûye û xwendina li wê medreseyê daxwaza gelek xwendevanan bûye. Ji malbata ‘Elî Herîrî gelek şêxên terîqetê rabûne. ‘Elî Herîrî xwendina xwe ya pêşî li medreseya bavê xwe xwendiyê. Feqî di dawiya gotinê xwe de dibêje ku beriya pazdeh saliya temenê xwe ku ez diçûm medreseyê, li wir dengbêjek hebû û gelek helbestên ‘Elî Herîrî jiber dizanibû. Di civatan de bi wî dengê xwe yî xweş, bi sitranî ji me re helbestên wî dixwend. Wê gavê min hêj bi nivîsandinê nizanibû ku wan helbestên hêja binivîsim û careke din kesekî wiha bi dest min neket.<sup>51</sup>

Gotinên Zeynelabidîn Zinar jî di der barê nav û dengê ‘Elî Herîrî de fikir didin me. Zeynelabidîn Zinar wiha dibêje: “Belê, nav û dengê ‘Elî Herîrî li Kurdistanê gelek belav bûye. Ew bi navê “Şêx ‘Eliyê Herîrî” tê naskirin. Pir kes, helbest û gotinên wî jiber dizanin. Xasma mele û feqe, di civat û caxiyên de jê bi xweşî dipeyivin û pesnê wî didin.”<sup>52</sup>

## **BEŞA DUYEM: BERHEMÊN ‘ELÎ HERÎRÎ**

### 2.1. DÎWAN

Di gelek çavkaniyan de behsa dîwana ‘Elî Herîrî tê kirin. Lê mixabin piştî vê behsa hanê tê gotin ku ev dîwan îro di destê kesê de tune ye. Ji vê dîwanê helbestên ku

<sup>50</sup> Sağniç, r.364

<sup>51</sup> Sağniç, r.366

<sup>52</sup> Zinar, r.29

gihîştine destên me bi qanda pêçîkên destên me tun in. Helbestvaneki ku di nav zanayên Kurdan de û di nav gelê Kurdan de ewqas nav û deng daye, hurmet jê re hatiye kirin û di bîra wan de cih girtiye, mixabin, bi qewlê Qanatê Kurdo sed mixabin, dîwana wî negihîştîye îroj. Ji ber vê yekê em ê jî li ser van helbestên wî bisekinin.

Ji van helbestên ku gihîştine me di nav wan de Margarîta Borîsavna Rûdenko gotiye ku destnivîsên ‘Elî Herîrî li St. Petersburgê di pirtûkxana Şaltîkov-Şedrîne ne.<sup>53</sup>

Qanatê Kurdo çend helbestên ‘Elî Herîrî weşandiye. Helbesta ku bi “Ger hun bibînin nalê eşq” ji Albert Sosin ku di berhevoka xwe ya bi navê "Kurdische Sammlungen (Petersburg, sala 1887, rûyê 278)" de weşandiye girtiye. Heman helbestê ji pirtûka Sadiq Behadîn Amedî “Hozanê Kurd” (Bexda, 1980) jî girtiye û weşandiye.<sup>54</sup>

### ‘Elî Herîrî: Nalê Eşq

#### Ji Albert Sosîn

Ger hûn bibînin nalê eşq,  
Tenê li bom zarî dîkin,  
Her kes bizanê halê eşq  
Bi hîle dijwarî dîkin.  
Bi halê eşq boxîl bûbûm  
Her dem di dem zelîl dibûm,  
Bê rêh û bê delîl dibûm  
Her kes bi xemxwarî dîkin.  
Hûn bar mekin xemên di zor,  
Le hesreta vardên di sor  
Çavê di reş bisk tene dor,  
E'nîya bi nûr tarî dîkin.

E'nîya bi nûr zilf tene ser,  
Rengîn dibin şems û qemer,  
Reşmar ji perdanê neder,

#### Ji Sadiq Behadîn Amedî

Ger hûn bibînin narê eşq,  
Tenîli bom zar dîken,  
Her kes dizanê halê eşq  
Bexil û dijwarî dîken.  
Bi halê eşq bexil dibim  
Her dem bi dem zelîl dibim,  
Bê rêh û bê delîl dibim  
Her kes bi xem xwarî dîken.  
Hûn yar meken xemên di zor,  
Ji hesreta derdên di mor  
Çavên te reşin bisk tene li dor,  
Enîya ji nûr tarî dîken.

Enîya şerîf bisk tene li ser,  
Rengîn dibin şems û qemer,  
Reşmal ji hebisana tene der,

<sup>53</sup> Mehmet Sait Çakar, Fehîm Işık, *Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakfı, İstanbul r. 104

<sup>54</sup> Kurdo, r.63,64

Li e're'ra yarî dikan.  
Hoş û e're'ra şimşa diket,  
Teşmîn reva sebir û xîret,  
Qahu medet, ahu medet  
Çeşman çi xubarî dikan.  
Çavê li rojê bîne kom.  
Came mey anî ji bom  
E'mir kir lazim vexom,  
Mestî ji min jarî dikan.  
Mest û şerab qendavê,  
Esîr û bendêt vê şevê  
Ger vesfê yarê ez bibêm  
Hûn terkî huşyarî dikan.<sup>55</sup>

Li ereraye yarî dikan.  
Xoş e're'ra û şemşa du ked,  
Ji mîn revand sebir û xîred  
Dad ûmeded dad û meded  
Çeşman çi xemarê dikan.  
Cot xumaran kirme def  
Tefsîr dikan sune'y sedef  
Roj xemilîn her çar teref  
Bi miskê tar tarî dikan  
Biskan li rûyê lê bîne kom  
Camê mey êna bom  
Hukmî dikir lazim vexum  
Mestî limin carî dikan  
Huşim çû bûn, mabûm di hom,  
Her- dem bi demlew ten bi coş,  
Mera qewî zewq û xuroş,  
Bi şahî xundkarî dikan.  
Bi şahî wan dan û kerem,  
Xizmet dikan turk û ecem,  
Miridê eşqê dem li dem,  
Li neqşê ceharê dikan.  
Neqş û nigarê navşan,  
Dîwan û wesfet şawşan, .  
Hey hey li cotêt padşan,  
Ecêb xoş serdarî dikan.  
Serdarî şaha rewneqe,  
Mue'ciza remzet ebleqe,  
E'li û mebêje ehmeqe,  
Li bazarê inkar dikan<sup>56</sup>

---

<sup>55</sup> Kurdo, r.57,58

<sup>56</sup> Kurdo, r.64

Weki ku li jorê xuya ye helbesta ku ji Sadiq Behadîn Amedî girtiye ji a ku ji Albert Sosîn girtiye dirêjtir e.

Helbesteka ‘Elî Herîrî heye ku M.B. Rûdenko li pirtûkxana Saltikov-Şedrînanê dîtiye. Qanatê Kurdo bi herfên Kurdî vê helbestê çap kiriye. Ev helbest bi “‘Elî Herîrî fermayed, ‘Elî Herîrî dibêje” dest pê dike. Me jî, vê helbestê di pirtûkeka ku Mela Zeynelabidîn el-Amedî bi destxetên xwenivisandîye û bi navê Menzûmetan bi nav kiriye de dît. Di serê vê helbestê de jî “‘Elî Herîrî fermayed, ‘Elî Herîrî dibêje” dinivîse. Di hinek cihan de cudatiya wan hene lê forma ku di menzûmetanê de ye rasttir û xweştir xuya dike. Lê dîsa jî formeke ji her dûyan rasttir ji wan çêdibe. Ji bo ku baş bê dîtin me wan li ba hev nivisand.

### **‘Elî Herîrî: Xelqno**

#### Qanatê Kurdo

Xelqno werin bibînin

Çi husneke bi kemal e

Heyran ji dil bibînin

Ji sene’ zewal celal e

Sene’ Xwedê ku danî

Sifhe ji nûrê danaye

Enber li ser kêşaye

Enber xet di xale

Xalên di şibê enberî

Dêm her wek qemerî

Ez têr nabim ji munzerê

Min naçit ji xeyalê

#### Menzûmetan

Xelqo werin bibînin

Çi husneke bi kemal e

Heyran ji dil bibînin

Ji sun’ê zu’l-celal e

Sun’ê Xwedê ku dayî

Sefhe-j nûrê daynayê

Enber li ser kêşayî

Ebrûyê xet û xal e

Xalê-d şubhê enberî

Dêm her wekî qemerî

Ez têr nabim ji menzerê

Min naçit ji xeyale

Min qet naçî ji bîrê	Min qet naçit ji bîre
Zilfêrî şîbê herîrê	Zilfêd şîbhê herîre
Wê li ser be dê munîrê	Wê li ser bedra munîr e
Dagirt bûn helale	Dagirtîbûn hîlale
Ebrû helala eyde	Ebrû hîlala ‘îydê
Dêm her wek xurşîde	Dêm her wekî xurşîdê
Eblek şîbê Nahîde	Eblek şîbhê nahîdê
Cibhet meha bi kemale	Cebhet meha’l – kemale
Cibhet meha tevave	Cebhet meha nûave
Rû sor gula bi xunave	Rû sor gulab xunave
Reyan hatne hindave	Reyhan hatne hunave
Nesrînyan da û pale	Nesrînan dawê pale
Nesrînyan çû wext beste,	Nesrînan çû beste,
Min nêrî pê hoste	Min nebîr pê heweste
Eqlê min çû ji deste	Eqlê min çû ji deste
Heyran kirim der hale	Heyran kirim der hale
Heyran bûm ez ji dinê,	Heyran bûm ez ji dinê,
Sohtim ji dest evînê,	Sohtim ji dest evînê,
Ji xwe nakim hêvya jînê	Ji xwe nakim hêvya jînê
Li-m kêr bûn mah û sale	Li-m kêr bûn mah û sale
Li-m kêr bûn mah û salan	Li min kêr bû mah û salan
Metne ji lam û dalan	Metnê ji lam û dalan

Ji ber zehmet û eşkelan

Ez têr dikim miqale

Çavê min xûn jê dibarî

Ji ber eblqêt xumarî

Wekî ava di carî

Bê wext û bê mecale

Gerden şûşa nebatê

Lêvê şerbeta heyatê

Ji hisna bit welatî

Bi min cahî helale

Methê di nazenînan

Û sefê di xûn di şerînan

Wekî dûr û yasînan

Ez her dikim emale

Baxê ku sed bihar lê

Bilbilê lalezar lê

Ku sed gulê bi xar lê

Bilbilî nala-nale

Ji Hindê bînin taracî

Ji Mermerî bînin xeracî

Ji Romê bistînin bace

Ji bo xemla şepale

Ji ber zehmet û eşkelan

Ez têr dikim meqale

Çavê min xûn jê dibarî

Ji ber ebleqêt xumarî

Wekî avê di carî

Bê weqt û bê mecale

Gerden şûşa nebatê

Lêv şerbeta heyatê

Ji husna bût û latî

Bi min cahê celale

Medhê di nazenînan

Wesfê di xûn şerînan

Wekî dewr û yasînan

Ez her dikim îmale

Baxê ku sed buhar lê

Bulbulê lalezar lê

Ku sed gulê bi xar lê

Bilbilênale nale

Ji Hindê bînin taracê

Ji Mermerî bînin xeracê

Ji Romê bistînin bacê

Ji bo xemla şepale

Dêma xalê di hûr lê	Dêma xalê di hor lê
Eyna zilfê sitûr lê	Îna zilfê-d şitûr lê
Rû nîva guhê tûr lê	Rewneqa guhê tûr lê
Mehbûbe bê mîsale	Mehbûbe bê mîsale
Hisna te ya hebîbe	Hisna te ya hebîbe
Dilekî min jê xerabe	Dilkî min jê xerîbe
E'î tu bikî nesîbe	Ellah tu bike nesîbe
Dest bidit wesale	Destê bidit wîsale
Hisna te ya dilxahe	Husna te ba dilxahe
Dilber lebsî sîyahe	Di ber <sup>57</sup> lubsê sîyahe
Bi min kaa'be Ella	Bi min ke'betu'l-lah e
Tewaf dikim her sale	Tewaf dikim her sale
Ji Hind bînin talanî	Ji Hindê bînin talanê
Bikin gilî sibhanî	Bikin kilê subhanê
Ji bo çavê şa-siltanî	Ji bo çavê sultanê
Dema bêtin ser sale	Dema bêtin ser sale
Çend bibêje Elî sadîq	Çend bêje Elî sadîq
Ji esrar û di qayq	Ji esrar û deqaiq
Ji wan wesfê di layq	Ji wan wesfê di layiq
Ji hisna ya delale <sup>58</sup>	Ji husneya delale <sup>59</sup>

---

<sup>57</sup> An jî Dîlber

<sup>58</sup> Kurdo, r.59,60,61

<sup>59</sup> Zeynelabîdîn el-Amedî, Menzûmetan, Diyarbakır Sözü, Dîrok Tune, r. 65,66,67,68



### ‘Elî Herîrî: Dîsan<sup>60</sup>

Dîsan<sup>61</sup> ji nû eşqa berê pur-enderûnim ateş e  
Zulfa müzeyyen 'enberê<sup>62</sup> de'wa digel xala reş e  
Xala li dêmê dil reva<sup>63</sup> sed rûh û canim<sup>64</sup> bin feda  
Sotim gelo çum tê nema terkîm<sup>65</sup> kirin eql û huş<sup>66</sup> e  
Eql û huşim<sup>67</sup> bûne esîr dinya ku geh geh tête bîr  
Dêm şubheta bedra munîr zulfa ji werdê bîn xweş e<sup>68</sup>  
Werdan ji nêv zulfan derîn şu'la binefşê têwerîn<sup>69</sup>  
Bala û qedda<sup>70</sup> 'er'erîn her yan li ser marê reş e  
Dîsane hey têt û teçit(diçit) îhyayî emwatan tebit(dibit)  
Wechan mudam nûr je teçit<sup>71</sup> dêm şubhetê şem'a geş e  
Şem'a şebistanan ewe werda gulîstanan<sup>72</sup> ew e  
Sirrê tebistanan<sup>73</sup> ew e şoxa Herîrî dil geş<sup>74</sup> e  
'Ecîb letîf û cindî ye ezman(ziman) nezan<sup>75</sup> û Rûmî ye  
Ageh ji eşqbazan niye<sup>76</sup> mest û xumar û serxweş e  
Serxweşê cama şerbetêdêm şubhê şem'a zulmetê  
Hûriya d'baxê cînetê<sup>77</sup> serdara çendîn mehweş e  
Mehweşê ku westan sef be sef ew hate der Mîsrê tekef  
Wan got Eliyo la texef meb'mirdînê qewî xweş e

---

<sup>60</sup> Yûsuf, r.26

<sup>61</sup> Zinar, r.32 "Dîsa" nivisandiyê

<sup>62</sup> Zinar, r.32 "'enberê" nivisandiyê

<sup>63</sup> Zinar, r.32 "dilreva" nivisandiyê

<sup>64</sup> Zinar, r.32 "can im" nivisandiyê

<sup>65</sup> Zinar, r.32 "terkêm" nivisandiyê

<sup>66</sup> Zinar, r.32 "heş e" nivisandiyê

<sup>67</sup> Zinar, r.32 "hişim" nivisandiyê

<sup>68</sup> Zinar, r.32 "bîn xweş e" nivisandiyê

<sup>69</sup> Zinar, r.32 "tê werîn" nivisandiyê

<sup>70</sup> Zinar, r.32 "qeda" nivisandiyê

<sup>71</sup> Zinar, r.32 "diçit" nivisandiyê

<sup>72</sup> Zinar, r.33 "gulîstanan" nivisandiyê

<sup>73</sup> Zinar, r.33 "di bostanan" nivisandiyê

<sup>74</sup> Zinar, r.33 "dilgeş e" nivisandiyê

<sup>75</sup> Zinar, r.33 "nizane, Romî ye" nivisandiyê

<sup>76</sup> Zinar, r.33 "işqbazan niye" nivisandiyê

<sup>77</sup> Zinar, r.33 "Horya di baxê cennetê" nivisandiyê

Vê helbesta ku bi “Dîsan” dest pê dike me di du pirtûkan de dît. Abdulreqîb Yûsuf û Zeynelabdîn Zinar di pirtûkên xwe de vê helbestê weşandine. Wekî ku bi jêrenivîsên me xuya ye di nav nivîsandina wan de gelek cuhahî hebûn.

### **Elî Herîrî: Têt<sup>78</sup>**

Dilêmezûn kefarete bêt ke em şeb taze mîhman têt<sup>79</sup>  
Bemizgînî beşaret bit ke mîhman canê canan têt<sup>80</sup>  
Ke mîhman canê canan e le ser çehvê me mihman e<sup>81</sup>  
Be mala cumleê xan e ke şahê cumleê xan têt<sup>82</sup>  
Were ey şahidê şêrîn ji eşqa te dil exsîrîn<sup>83</sup>  
Be can menzîlgehê mîr in telebkarî ke sultan têt<sup>84</sup>  
Telebkar in dil araîm medîm yarin bû yî şaîm<sup>85</sup>  
Le bejna 'er'erîn daîm siyeh mar lêbe colan têt<sup>86</sup>  
Siyeh maran kire seyran le cotê şubhetê cîran<sup>87</sup>  
Ku xas û 'am bibûn heyran le<sup>88</sup> cîran 'enber efşan têt  
Du zulfên 'enber efşan in du le'lân<sup>89</sup> şekeristan in  
'Eqîq û durr û mercan in le hewzan abêheywan<sup>90</sup> têt  
'Eceb bir ke mirarî têt le seddêqewsê tarî têt<sup>91</sup>  
Siyeh pencên xumarî têt ji mexmûran du eslan têt  
Ji mexmûran tu mexmûr î be cî hişt 'eqreba jûrî<sup>92</sup>  
Tewafa beytê me'mûrî le burcan xûn be sîran têt<sup>93</sup>

---

<sup>78</sup> Yûsuf, r.27

<sup>79</sup> Zinar, r.30 “kî îmşeb” nivisandiye

<sup>80</sup> Zinar, r.30 “Bi mizgînî beşaret bit kîmîhman canê canan têt

<sup>81</sup> Zinar, r.30 “kî mîhman, li ser çehvê” nivisandiye

<sup>82</sup> Zinar, r.30 “kî şahê cumleyê” nivisandiye

<sup>83</sup> Zinar, r.30 “êxsîr in” nivisandiye

<sup>84</sup> Zinar, r.30 “bi can menzîlgehê mîr in telebkarê kî sultan têt” nivisandiye

<sup>85</sup> Zinar, r.30 “dîlara yim” nivisandiye

<sup>86</sup> Zinar, r.30 “li bejna...sîyehmar lê bi...” nivisandiye

<sup>87</sup> Zinar, r.30 “siyehmaran kire seywan li cotê” nivisandiye

<sup>88</sup> Zinar, r.30 “li” nivisandiye

<sup>89</sup> Zinar, r.31 “le'lân” nivisandiye

<sup>90</sup> Zinar, r.31 “li hewza Abiheywan” nivisandiye

<sup>91</sup> Zinar, r.31 “Ecêb berk e merarî têt li seddê qewsê tarî têt” nivisandiye

<sup>92</sup> Zinar, r.31 “bi cibhet eqreba jor î” nivisandiye

<sup>93</sup> Zinar, r.31 “li burcan xwîn bi seyran têt” nivisandiye

'Eqarib hat û bê hed hat le wê burca zeberced hat<sup>94</sup>  
 Vebala qewsêeswed hat le telbey mahî taban têt<sup>95</sup>  
 Le heyva kewçêrîn kamil ve ehlan ra nehiştin dil<sup>96</sup>  
 Ê cumle da sefên sunbul le<sup>97</sup> hindavêgulistan têt  
 Gulîstana Xuda riste le çar etraf dilan xuste<sup>98</sup>  
 Binefş û nêrgiza mest e cinisrê le'l û reyhan têt  
 Reyahîn sosin û werd in le<sup>99</sup> Şêx Elîye xerîb ferd in  
 Weriste ehmer û zerd in herû sed car di efxan têt<sup>100</sup>  
 Ji efxanan nemayim têt du'agoyê tu ez bê vir  
 Bebête şer du esleh dîr 'heta vî qasidî can têt<sup>101</sup>  
 Bebîne rû şemalînêwere hindavî balînê<sup>102</sup>  
 Ji dest ahan û nalînê çe reng feryad ji esman têt<sup>103</sup>  
 Be feryad û be hawar e ji dest ahan min ew kar e<sup>104</sup>  
 Me lazim bendeê jar e ji seyyidî çe ferman têt<sup>105</sup>  
 Seyyidî heq nezer vêra di îqlîman ilim gêra<sup>106</sup>  
 Qitara gewheran vêra ji nêv kana bedexşan têt<sup>107</sup>

Vê helbestê jî Abdulreqîb Yûsus û Zeynelabidîn Zinar di pirtûkên xwe de weşandine. Abdulreqîb Yûsuf di der barê vê helbestê de dibê ku: “Ev helbest tamam nîne, hindêk jê ketiye. Vê yeka han di destnivîsê de dixuye.”<sup>108</sup>

Qanatê Kurdo vê helbesta ku em ê li xwarê bidin ji Sadiq Behadîn Amedî girtiye û di pirtûka xwe de weşandiye.

Didara te ez zîn kem,

<sup>94</sup> Zinar, r.31 “li wê burca zeberced ha” nîvisandiye

<sup>95</sup> Zinar, r.31 “vibala qewsê eswed hat li telbê mahîtaban têt” nîvisandiye

<sup>96</sup> Zinar, r.31 “li hîva kewçîrîn kamil vi ehlan ra nehiştin dil” nîvisandiye

<sup>97</sup> Zinar, r.31 “li” nîvisandiye

<sup>98</sup> Zinar, r.31 “gulîstana xwedareste li çar etraf dilan xweste” nîvisandiye

<sup>99</sup> Zinar, r.31 “li” nîvisandiye

<sup>100</sup> Zinar, r.31 “werestê ehmer û zerd in hero sed car di efxan têt” nîvisandiye

<sup>101</sup> Zinar, r.31 “bibîte şer du esleh dir heta vî qasidî can têt” nîvisandiye

<sup>102</sup> Zinar, r.31 “bibîne rûşemalînê were hinda vibalînê” nîvisandiye

<sup>103</sup> Zinar, r.32 “çi rengferyad ji esman têt” nîvisandiye

<sup>104</sup> Zinar, r.32 “bi feryad û ji dest ahan mine w kar e” nîvisandiye

<sup>105</sup> Zinar, r.32 “mel azim bendeyî jar e ji seyîdê çi ferman têt” nîvisandiye

<sup>106</sup> Zinar, r.32 “seyyêdê heq nezer vê ra diiqîlman ‘elem gêra” Qanatê Kurdo “Seyda” nîvisandiye

<sup>107</sup> Zinar, r.32 “qutara gewheran vê ra ji nêv kana bedexşan têt” nîvisandiye

<sup>108</sup> Yûsuf, r.28

Heta kengê ruh te teng kem,  
 Keser bûm carekê bîn kem,  
 Xudana têt û destmala.  
 Xudana têt û cebhet bê  
 Xerac û erd û qîmet bê  
 Didara te bi qîmet bê,  
 Li Eyd û cejn û sersala  
 Evel kar û kesê min tuy,  
 Yeşîn fîrna dersê min tuy,  
 Kesê min û besê min tuy,  
 Li zer û mal û pîr nala.  
 Li zer û mal û pîr rencim,  
 Kesadim, şahîbim, gencim,  
 Li bajêra guhêr sencim,  
 Sefer diwere heta mala.  
 Sefer di werê şebê tarî,  
 Ey E'îlî û tu pîr ray,  
 Da bikeyn zikir cebarî,  
 Belki li me xoş bêt sala.<sup>109</sup>

Abdulreşîb Yûsûf di behsa 'Elî Herîrî de helbestek ku navê 'Elî Herîrî li serê ye lê hinek jê ketiye û baş nayê xwendin weşandiye. Ev helbest bi qederê ku hatiye xwendin ev e:

Xelqna bebin.....  
 Her çar kenar seyran biken hindî le bin wêran biken  
 Milkê Ecem talan biken ew paşê hukme xundîkar(xunkar)  
 şan tarac bikin  
 Zêrîn le toqê tanc bikin gelwaz jikul bê şumar  
 Gelwaz di sor in toq di zer neqşêsewadî kin di ber<sup>110</sup>

---

<sup>109</sup> Kurdo, r.62

<sup>110</sup> Yûsuf, r. 28

Di kovara Hêviyê de jî çarekek nîsbetî ‘Elî Herîrî tê kirin. Ji bo vê çarekê wiha dibên: “Her wekî hozanê mezin ‘Elî Herîrî dibê, dişêreka xwe de

Her kesê eşiq tê eser ket

Sed hezar perdan di ber ket

Hemiyan dê ker bi ker ket

Tazî û uryanim ez<sup>111</sup>

Di helbestên ‘Elî Herîrî de mora wî bala mirov dikişîne. ‘Elî Herîrî bi rêbazek wisa helbestên xwe nivisandiye ku mirov bi xêra wê rêbazê dizane ku ew helbest teqez helbesta ‘Elî Herîrî ye. ‘Elî Herîrî di serê çareka xwe de peyvên ku di çareka berê ya dawî de hatiye bikaranîn bi kar tîne. Mînak:

Didara te ez zîn kem,

Heta kengê ruh te teng kem,

Keser bûm carekê bîn kem,

Xudana têt û destmala.

Xudana têt û cebhet bê

Xerac û erd û qîmet bê

Didara te bi qîmet bê,

Li Eyd û cejn û sersala

Evel kar û kesê min tuy,

Yeqîn firna dersê min tuy,

Kesê min û besê min tuy,

Li zer û mal û pir nala.

Li zer û mal û pir rencim,

Kesadim, şahibim, gencim,

Li bajêra guhêr sencim,

Sefer diwere heta mala.

---

<sup>111</sup> Mûsa KAVAL, Keça Gavan û Kurê Mîr, Kovara Hêvî, Hejmar 4, 1985,r.44

Sefer di werê şebê tarî,  
Ey E'lî û tu pir ray,  
Da bikeyn zikir cebarî,  
Belki li me xoş bê sala.

Helbestên ku bi navê 'Elî Herîrî hatine weşandin di tevan de ev mora wî bi awakî diyarkirî xuya ye. Ev rêbaz taybetiyek helbestên 'Elî Herîrî ye û balkêş e. 'Elî Herîrî di helbestên xwe de evînê neqîşandiye. Di Hespê Reş de mijar û hinek cudatîyên dinê hene em ê di cihê wî de li serê bisekinin. Peyvê ku 'Elî Herîrî pê şibandinê dike dixwazim binivîsînim da ku xweştir bê fehmê.

Evîn, xem, werd, bisk, mey, şerab, husn, dana,xal, dêm, enber, ebrû, sorgul, xunav, nesrîn, binefş, nêrgiz, reyhan, sosin, 'er' er, xumar, lêv, husn, bilbil, lalezar, gul, şepal, hebîb, mehbûb, dîlber, şox, sohtin.

'Elî Herîrî bi van pêyvên jorê xwestiye ku daxwaza xwe bibêje. Ev peyv jî evînê nîşan didin. 'Elî Herîrî teşbîha evîndarê bi tiştên giranbuha dike, ji destê fîraqê feryad û fîgan dike. Bêhnên evîna tesewwîfî ji helbestên wî tên. Jixwe Rojen Barnas dibê ku hetanî şai'rên Hewarê (Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can) şa'irên kurmancî gişt mutasawwif in.<sup>112</sup>

Di helbestên xwe de çend navan bikartîne. "Elî Sadiq, 'Eliyo, Şêx 'Elî, Herîrî, 'Elî, Seyda (Seyda heq nezer vê ra)" Her çî qas evan nav dibin sedemê gumanê lê wekî ku me li jorê got li ser helbestên wî mora wî heye, ev mor nîşan dide ku hemû berhem ji aliyê yek nivîskarî ve hatine nivîsandin. Abdulreqîb Yûsuf ji bo helbesta Xelqo an Xelqno ji ber ku 'Elî Sadiq tê de derbas dibê ev helbest ne eva 'Elî herîrî ye<sup>113</sup>, a Sadiq e lê ev sadiq wesfê 'Elî Herîrî ye ne nav e.<sup>114</sup>

---

<sup>112</sup> Rojen Barnas; "Li Ser Bateyî Çend Gotin", Kovara Hêvî, hejmar 2, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1984, r. 36

<sup>113</sup> Yûsuf, r.18

<sup>114</sup> Yûsuf, r.18

## 2.2. QEWLÊ HESPÊ REŞ (BORÊ QER)

Li ser Feqiyê Teyran M. Xalid Sadinî xebatek xweş kiriye. Di vê pirtûkê de û di çavkaniyan de gava behsa Qewlê Hespê reş tê kirin, tê gotin ku ew berhema Feqiyê Teyran e. Lê di vê pirtûkê de naveroka Qewlê Hespê Reş tune ye. M. Xalid Sadinî li serê wiha dibêje: “Bi rastî min ev destana Feqiyê Teyran nedîtiye û derbariyê naveroka wê de jî tiştêk nexwendiyê. Lê vekolerên li ser Feqiyê Teyran dipeyivin tev jî qala vê berhema wî dikin. Çavkaniyên bi dest min ketine kesek di wan de qala naveroka vê pirtûkê nake.”<sup>115</sup> Di çend malperên înternetê de tê gotin ku Qewlê Hespê Reş li Rûsya yê bi Rûsî-Kurdî hatiye weşandin.<sup>116</sup> Lê Qanatê Kurdo vê pirsê zû de zelal kiriye. Dibê ku: “Naveroka Beytên “Şerê Sîsebanê (yanê jî “Newala Sîsebanê”), “Hespê Reş” û “Dimdimê” zûva aşkere û e’yane, ew li berhevokêd folkloran de hatine çapkirin û tercime kirinê. (binêre A.Sosîn, *Kurdishe Samlungen*, SPT, 1880; heciyê Cindî, *Emînê Evdal*, *Folklor Kurmancî, Êrevan...*)”<sup>117</sup>

Di serê vê helbestê de Mela Zeynelabidîn el-Amedî “Hîkaye Hespê Reş (Borê Qer), Qewlê Elî Herîrî” nivisandiyê. Lê ji vana giringtir di dawiya helbestê de tiştêk wiha derbas dibe:

Ev xebera ji gotî

‘Elî Herîrî jê sotî’<sup>118</sup>

Ev hevok nîşan didin ku vê hîkayê eva ‘Elî Herîrî ye. Piştî vana ez çûm ba Mela Zeynelabidîn El-Amedî û min jê pirsî ka ev tişt çewa ketine destên wî. Mela Zeynelabidîn El-Amedî wiha got: “ Helbesta Elî Herîrî ku bi ‘Xelqo’ dest pê dîke û hîkayeya ‘Qewlê Hespê Reş’, min ji Mela Dawid girt. Mela Dawid birayê Mela Mihemedê Dengnekir e. Ne şaş bim li Swêdê dijî. Ev helbest bi herfên Lafînî nivisandî bûn. Min jî vegerand herfên ‘Erebî.’”

---

<sup>115</sup> Sadinî, r. 58

<sup>116</sup> Vikipedi, Feqiyê Teyran, Dema Giyanê:17.07.2013, [http://tr.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA\\_Teyran](http://tr.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran)

<sup>117</sup> Kurdo, r.72

<sup>118</sup> Zeynelabidîn El-Amedî, *Menzûmetan*, Diyarbakır Söz Matbaası, Amed 2002, r.93-94

Abdulreqîb Yûsuf behsa gotareka Dr. Îzeddin Mistefa dike ku ew gotar di kovara Defterî Kurdewarî de hatiye weşandin. Di vê gotarê de Dr. Îzeddin Mistefa dibêje ku “Qewlê Hespê Reş” bi destnivîs bi navê ‘Elî Herîrî heye û ev destnivîsa han di destnivîsa Kurdî ya 36an de di nav destnivîsên Lenîngradê de ye.<sup>119</sup> M.B. Rûdenko di gotareka xwe de dibêje Alexandre Jaba gotiye ku “Qewlê Hespê Reş” ne berhema Feqiyê teyran e, ev a ‘Elî Herîrî ye. Bi rastî heta niha min jî wisa bihîstibû. Piştî van destnivîs û agahiyên û ku navê ‘Elî Herîrî di vê nivîsê de ye derbas dibe îdî tu guman ji mirov re namîne ku ev behrem a ‘Elî Herîrî ye.

Hîkaya Qewlê Hespê Reş ji tîpê Erebi min veşand tîpê Latîni. Wiha dibêje ‘Elî Herîrî:

Mecal ew mecal bû

Kafîrek dîn betal bû

Hepsek çê li bal bû

Hespê di nêv kuffaran

Bi dil ew bû Musluman

Muhammed pê ellam e

Muhemmed deng hilşîne

Heçî hespê reş bîne

Qesrek ji min bistîne

Eshabê çil peter in

Hemî têk difikirin

Mêr ji mêran çêtirin

Sirran ji yek digirin

---

<sup>119</sup> Yûsuf, r.18



Emer'ubnu Xetab e<sup>120</sup>

Kuştiyê da û bab e

Ne xêr e ne sewab e

Fi'l-halî da cewab e

Ew şolekî sewab e

Ew hespê te divêtin

Biçim ji bo te bînim

Min cildo nevêtin

Emer e ve dibêtin

'Elî jixwe fihête

Min tişteki nevête

Emer sivik wek ba bû

Zû ji dîwanê rabû

Di xizmetê westa bû

Emer e rabû xweş e

Li piştê dest terkeş e

Çû telbe hespê reş e

Bi çol û çolistanê

Li deşt û biyabanê

Ajote şaristanê

Ez im mêrê belav e

---

<sup>120</sup> Menzûmetan, Zeynel Abidîn El-Amedî, Metbeeya Diyarbakır Söz Gazetesi, r.84

Gerya li şaristan e  
Sual kirî punhan e  
Li keşe bû mehvan e  
Keşe ku çî xeber e  
Merivê pêxember e  
Sed cara pê xeber e  
Hatime îzharî kim  
Sirra xwe guftarî kim  
Hespê reş geryarî kim  
Keşe gotî bilave  
Buha zor û wexav e  
Çillê tu min dirav e (r.85)  
Keşe ku min divêtin  
Mêhvanê min bibîtin  
Go navê min Emer e  
Kifş e ew ne bi der e  
Qasidê pêxember e  
Go hişe mêr d'bihîtin  
Serê te dibirîtin  
Zêr û malê diçîtin  
Go ez Emerê sor im  
Şêrê merteb ji jor im

Ji serê xwe diborim  
Di Hespê Reş naborim  
Keşe go paçê got(i)ne  
Ser û malê di min e  
Hemû têkî biçîne  
Ser im bi serê te ra  
Çêrim bidin ji xwe ra  
Keşe ye barê şerra  
Keşe birayê mîr bû  
Li lende hû wezîr bû  
Pir ew ji wî tedbîr bû  
Hero dîwana mîr bû  
Keşe keçek çê-l bal bû  
Ciwanek bi kemal bû  
Enî ji xet û xal bû  
Navê ewê Leymûn bû  
Leymûn e xweş Leymûn e  
Sir li wê zahir bûne  
Min daye bi yeqîn e  
Here ji bo xwe bîne  
Leymûnê bi lêbas ke  
Bi kevî û kiras ke (r.86)

Mêhvanîm tu xelas ke  
Keşe weled hebûne  
Sivik in wekî ko ne  
Bi dîwan ve diçûne  
Ew dîwana kuran e  
Kafir têda westane  
Lendeho keşe bira ne  
Bû keşe hat Qureyş e  
Mecnûn e bê te pêş e  
Hespê Reş kit teftêş e  
Mîr go keşe birayê min e  
Hinkî ferk û bi fen e  
Bigirin wî bi kujne  
Dijminê serê min e  
De'wayê hespê min e  
Lez kin û bilezînin  
Kêrana biçerxînin  
Xewlanê<sup>121</sup> jê' b derînin  
Kêrê dem û kar kirin  
Ji serê heta xwar e  
Bigrin hun tev yek car e

---

<sup>121</sup> An jî "xewnanê"

Lendeho go qet venabin  
Qasid jixwe terxan in  
Di nêv me ew ji wan in  
'Amiyê pê dizanin  
Xelat li ser milan in  
Go hespê te bidîtin  
Kuştiyê çil mêter e  
Ew xwe jixwe Emer e  
Mêteran çi dehşet e  
Girêdan ber û pişt e (r.87)  
Bi dev û bîn di kuşte  
Hespê tu yî dizanê  
Kuştiyê çil xopanê  
Hasma ew î beyanê  
Weqtê dê wê bibînî  
Divê tê derîfînî  
Bi talan dişeqînî  
Zêr û mal bû me'd mînî  
Mêrê qewî kerem bû  
Bi wan çêranî nerm bû  
Ro lê zer û di sor bû  
Go herin bila bêtin

Eger di dêrê bêtin  
Bila zîn lê bikitin  
Li meydanê bidîtin  
Her we ji bo xwe bêtin  
Eger ew dê newêrî  
Celladê wî hadirî  
Dê xwe li ku veşêrtin  
Keşe dibû yoldaş in  
Bi kennê û temaş in  
Ji dîwan çûne paş in  
Xeber bir ew yoldaş in  
Go heyhote heyhote  
Mîrê me qencî gote  
Hespê dixwe firote  
Çûye behane gote  
Em şer kirin ji bo te  
Emerê digel keşe  
Hilîna wan terkeşe  
Meşiya Hespê Reş e  
Emer e çû gulanê (r.88)  
Hespê li tewle xanê  
Ew xweş dihat cewlanê

Emer çûye ji der da  
Yasîn xwendî ji ber da  
Borî digel xeber da  
Emer hesp anî der e  
Lêkirî zînê zer e  
Şidandî teng û ber e  
Li piştê<sup>122</sup> ket Emer e  
Çend seran digerîne  
Li hespê dixurîne  
Li ser sûrê difirîne  
Emer siwarek serbest e  
Ket û sitû neşikeste  
Celew maye di dest e  
Kewran heyf lê dixweste  
Emer hesp da meydanê  
Yek bû li wê sen'anê  
Xeber be li kewranê  
Keşe î musulmanê  
Li kewran bû hewar e  
Ji bircan hate xwar e  
Digel keşeê qal e

---

<sup>122</sup> An jî "Ser piştê"

Keşê şer bi şîr kir  
Emerê şer bi tîr kir  
Meydan ji xwînê têr kir  
Keşê şerrekî zor kir  
Bi misrîyê muhur kir  
Meydan ji xwînê sor kir  
Emer şerrekî xweş kir  
Bi tertîb û bi şeş kir  
Meydan tijî wî leş kir (r.89)  
Ew keşê wehîd e  
Merteba wî tewhîd e  
Kewranî kir şehîd e  
Kewran û hem Frengan  
Rim dane binê cengan  
Li Emer kirne deng e  
Cîyek bi kûr û av bû  
Hespê di reş wî xam bû  
Emer jê'bxwe bi nav bû  
Emerê dê wê carî  
Dêrek li ber wî warî  
Qesd kirye çû diyarî  
Emer çû bi deştê da



Dêrek dî wî di rê da  
Çil rahib in wê têda  
Go rebeno miraro  
Ji dêrê were xwaro  
Me di dêrê xesaro  
Kewran kola cînon e  
Lez ke we bilezîne  
Hesar di dêrê nîn e  
Dêra me pir asê ne  
Hesar ji bo tunî ne  
Emerê ew sermest e  
Hilîna her du dest e  
Dua'j Xwedê dixweste  
Derê dêrê şikeste  
Emer bixwe hespê ve  
Her dû çû bi dêrê ve  
Di çil rahib dinêve  
Emer şolekê çêkir  
Serê çil rahib jêkir (r.90)  
Derê dêr pê asê kir  
Tîyîtê kewran hatin  
Li dor dêrê wer hatin

Li hev û din gerandin  
Tîyîtê Kewran tîne  
Li dor dêrê wer tîne  
Kelkêtê di tarîne  
Çokanê lê hilîne  
Dev sor bûye ji xweynê  
Cewab çûye Medîne  
Eshaban got biçîne  
Wan go hêj Emer xweş e  
Bi tîr û bi terkeş e  
Li pişta Hespê Reş e  
Eshab rabûn xas û ‘am  
Hemî têk hejînan e  
Da biçîne tewlan e  
Bi gurzan û bi xeylan  
Pif kirine nefîran  
Hatine şahê mîran  
Jê bibînî ixsîran  
Lez kin û bilezînin  
Bi zincîran hun bînin  
Li dor dêrê werînin  
Çar kenar ser hilînin

Emer ji nav derînin  
Dê biçne ser Medîne  
Nehêl bibe hewarê  
Bikirne da talanê  
Eshaban kirin birîn  
Rimê'd qesebê bînin  
Ku' hatin da biçînin (r.91)  
Ya derê musulmanan  
Bezîne cebhexanan  
Bînin sîlahê'd şîran  
Cebhexane vekirin  
Xwe re zere dibirin  
Di ber xwe û hespan dikrin  
Koma selewatiya ne  
Alay li ber ketine  
Sed selewat li Nebî ne  
Koma sor û sipî ne  
Alay li ber ketiye  
Sed selewat li Nebî ye  
Koma kesk û sor û zer  
Eshaban dê kente ber  
Ew birahê pêxember

Eshabe wî dihatin  
Kafir ji ber hilatin  
Xwedanê'd pût û Lat in  
Eshabê vê qubî ne  
Kafir ji ber hiltîne  
Dikevin sef dişkîne  
Hey hewara Hemze ye  
Şûr hungivek zêde ye  
Kafir direv wek se ye  
Hey hewara 'Ebas e  
Xwedanê şûrê xas e  
Kafir nebûn xelas e  
Hey hewara Bû Bekr e  
Şêr e we ku emîr e  
Ew î xweş xwe du ta kir  
Di kom da kom ber ba kir  
Hey hewara Osman e (r.92)  
Her di dev de Qur'an e  
Xwedanê şûr birran e  
Kafiran kir eman e  
Hey hewara Selxo ne  
Rimê wekî sitûn e

Çi kafirek mel'ûn e  
Hey hewara Hovanîs e  
Kafirek xwîn alîs e  
Kafirê bê dalîz e  
Hey hewara bextiyar e  
Ji wir da hate xwar e  
Çi kafirek pir har e  
Hey hewara wê nezr e  
Wî di dest anî tevr e  
Hat nalê pêxember e  
Hey hewara ferfûr e  
Di destê wî da şûr e  
Çi kafirek sitûr e  
Hey hewara 'Elî ye  
Li Duldulê sipî ye  
Di komê da firîye  
Wekî ew dî Emer e  
Jê dêrê biçne der e  
Kafir û Mehmedyan şer e  
Emer ji dêr hate der  
Li bor şidand teng û ber  
Li sur piştê ket Emer

Emer ji wir da têtin  
Ferfûriyî davêtin  
Çendê wî dî dixebtin  
Gaziya wan mêran tê  
Nêrînîwan şêran tê  
Ev xebera ji gotê (r.93)  
‘Elî Herîr jê sotî  
Emer û gel eshaban  
Wan kafiran dibizdand  
Pişt berê me wergerand  
Xaç û peyker di destand  
‘Elî kafir dibirrîn  
Di çîl çîyan werdikrîn  
Xaç ji xewnê çêkirin  
‘Ewrekî reşê tarî  
Baranek jê dibarî  
Bû sonda ‘El(i)yo Emerê  
Şehîdê-d Huneyn û Bedrê<sup>123</sup>

Wisa xuya ye ku ev hîkaye nîvcû maye. Ez bawerim ku ji nava vê çîrokê hinek beş kêr in. Evê hîkayê bi berahî di dîroka Îslamê de tune. Ji min re wisa tê ku di nav kurdan de dibe ku hîkayeke wisa hebûye û ‘Elî Herîrî jî vê hîkayeyê vegerandibe. Mîrekî pê hisiyaye ku hespekî çê li cih kî heye û gotiye ku kî vî hespî bîne ez ê qesrekî

---

<sup>123</sup> Zeynelabidîin El-Amedî, *Menzûmetan*, Diyarbakır Söz Matbaası, Amed 2002, r.84-94

bidimê.... Dibe ku çîrokek wisa di nav Kurdan de hebûye û ‘Elî Herîrî leheng û şiklê wê guhertibe.

Li ser çîroka Qewlê Hespê Reş, Ebdullah M. Varlî xebat kiriye û bi vî navî çîrokek weşandiye. Ev çîroka ha, ji a me ji Menzûmetanê girt bi çend taybetiyan cihê ye. Çîroka ku hatiye weşandin dirêj e, 76 rûpel e. Nivîskar mijarên çîrokê di beşa de bi teşekî bipergal diherikîne. Di çîrokê de kêmasî û qutbûn tune ye. Aşîkar e ku ji binyada nivîskî gihîştîye roja me.<sup>124</sup>

Ebdullah M. Varlî (Xweda rehma xwe lê ke) li ser Qewlê Hespê Reş ku a kî ye, şîroveyan dike. Dibê: “Ez guman dikim ku ev çîrok ji aliyê Feqiyê Teyran: Mîr Mûhemmedê Mako ve hatibe nivîsandin.”<sup>125</sup> Gava mirov li mînakên dîrokî dinihêre ev mijar xweştir tê fêmê. Hinek çîrok ji aliyên gelek kesan ve hatine nivîsandin. Her wekî em dizanin çîroka Mem û Zînê bi destê çend kesan hatiye nivîsandin. Beriya Ehmedê Xanî çîroka Mem û Zînê hebû lê wî, wê çîrokê ji nû de nivisand. Li ser vê çîrokê jî ev rewş xuya ye. Ji ber ku navê ‘Elî Herîrî di dawîya çîroka ku me di pêş de nivisand de heye em teqez dikarin bêjin ev çîrok, a ‘Elî Herîrî ye, lê di dû re Ehmedî Xanî jî, vê çîrokê di sala 1681an de nivisandiye.<sup>126</sup> Belkî Feqiyê Teyran jî nivisandibe lê beriyan wan ‘Elî Herîrî cara yekem vê çîrokê nivisandiye. Dixwazim ji serî û dawîya vê çîroka ku Ehmedî Xanî nivisandiye çend rêzan binivîsim.

Qelem guftî bîsmîllah, piştî wê sena Xweda

Summe wî selat bide, li ser hebîbê Xweda

Xweda yek e bê weled, da û baban ew neda

Bê şerîk û heval e, bê nezîr e xulqê da

...

Hem Ehmed belengaz e, niyazê rehma te ra

Heyata wî bi xalyaz, nebû dersa mawera

---

<sup>124</sup> Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmed ê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanên Sîpan Yayin Evi, Ankara 2004, r. 412-499

<sup>125</sup> Varlî, r.421

<sup>126</sup> Varlî, r.418

Ev çend kelimêd mewzûn, vêxist Xanî bo we ra

Xweda!

Ew rûreşê bê newa, muhtacê rehma te ra

Xilas bû ev rîsalê, tarix lefzê “xesb” kera

Ya reb! Deftera Ehmed bigrî di roya heşra

**ENCAM**



Bi rastî di pirê çavkaniyan de behsa ‘Elî Herîrî tê kirin lê agahiyên di der barê wî de pir kurt in û hev nagrin. Agahiyên kurt û pirdibetîyan, pisrgirêk û gumanan çê kirine. Yek ji van gumanan dema jidayîkbûna wî ye. Abdulreqîb Yûsuf her çî qas dîroka mirina wî sala 1660 pejirandiye û li gora xwe hinek şîroveyan kiriye lê dîsa delîlekî ku bibe sedema qenaetek vebir di destên wî de tune ye. Ji ber kesên ku li ser jidayîkbûna ‘Elî Herîrî xebitîne Alexandre Jaba û Mele Mehmûdê Bazidî ne û di demek zû de nivisandine, li gorî fikra min gere mirov gotina wan bipejirîne. Mele Mehmûdê Bazidî ji mere gencîneyek di der barê wêje û folklora Kurmancî de hiştiye. Bi Alexandre Jaba re li ser mijarên Kurmancî xebitiye, ji ber vê di destên mirov de delîlek tune be mirov gere gotina wan zû bi zû navêje pişt guhên xwe. Ji ber vê em ê bibêjin ku ‘Elî Herîrî di sala 1009ê zayînî de welidiye. Bi vê pejirê ‘Elî Herîrî dibe helbestvaniya Kurmancî de dibe helbestvanê yekem.

Mijarek dinê ku li ser nîqaş hatiye kirin cihê jidayîkbûna ‘Elî Herîrî ye. Dibên li Herîra Bêdlîsê, Herîra Şemzînanê û Herîra Hewlêrê hatiye dinê. Lê her dû dibetiyen pêşîn li gorî fikra min lawaz in lewra Herîra Bêdlîsê di cihek tenê de derbas dibe û çavkanî nehatiye nîşandan; li gorî pirsên melî Şemzînanê gundê Herîr tune ye, gundê Nehrî heye. Bi rastî Herîr di nav Şemzînan û Hewlêrê de ye. Ji Şemzînanê dûre lê nêztirê Hewlêrê ye. Ji ber ku berê tixûbên îro tune bûn, wê wextê dibe ku hem bi navê Şemzînanê hem jî bi navê Hewlêrê hatibe yadkirin. Lê îro gere em wê bi navê Herîra Hewlêrê hildin.

Di çavkaniyan de behsa ‘Elî Herîrî ku çûye Şamê tê kirin û dibêjin nivtemenê xwe li derveyî Herîrê borandiye. Biçûkantiya wî jî li gundê Herîrê derbas bûye, li medreseya bavê xwe xwendiyê. Medreseya bavê wî medreseyek namdar e û gelek xwendekaran xwestiye ku li wê medreseyê bixweyînin.

Di nav gelê Kurdan de ‘Elî Herîrî bi helbestvaniya xwe û bi zanyariya xwe namdar e. Nexasim li medreseyan ew tê naskirin û helbestên wî tînin xwendin. Di çavkaniyan de derbas dibe û di nav gel de tê zanîn ku dîwaneka ‘Elî Herîrî heye lê ew dîwan negihîtiye me. Bitenê çend helbestên ‘Elî Herîrî gihîştine me û mora ‘Elî Herîrî li ser wan helbesta ye ku kes gere nikaribe viya nepejirîne. Hem navê wî di helbestan de derbas dibe hem jî di dawîya çarekan de peyvên ku derbas dibin bi wan peyvên çareka

nû dest pê dike an jî di çareka nû de yek ji wan peyvan derbas dibe. Ev jî stîla ‘Elî Herîrî ye û di tevê helbestên wî da ev stîl heye.

Di vê xebata xwe de em di gelek berheman de li dû rêç û şopên ‘Elî Herîrî çûn. Di şopandinê de me pirtûkek bi navê Menzûmetanê dît. Di vê pirtûkê de helbestek ‘Elî Herîrî ku bi Xelqo dest pê dike û çîroka wî ya bi navê “Qewlê Hespê Reş(Borê Qer)” hebû. Di dawiya “Qewlê Hespê Reş” de navê ‘Elî Herîrî derbas dibe. Ev jî nîşan dide ku ev berhem a ‘Elî Herîrî ye. Bi dilê min ev rasthatin tiştêkî xweş bû. Di vê pirtûkê de bi navê Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û kesên din helbest hene. Ev pirtûk bi destvîvîsa Mela Zeynelabidîin El-Amedî hatiye nivîsandin. Ji ber ku Mela destxetên Zeynelabidîin gelek xweş in, pirtûkan bi dest dinivîse û hejmarek hindik li teb’ê dixê lê ev pirtûkên wan nakevin destê herkesî.

## ÇAVKANÎ

- AZÎZAN Herekol ;*Kovara Hewarê*, Weşanxana Nûdem, Cild 2, Stokholm, 1988
- AMEDÎ Bedirxan, Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal Siyahpoş, Weşanên Nubihar, Stenbol 2011
- BARNAS Rojen ; *Rastnivîsîna Kurdî*, Kovara Hêvî, Hejmara Yekem, Paris-Fransa 1983
- BARNAS Rojen; “*Li Ser Bateyî Çend Gotin*”, Kovara Hêvî, Hejmar 2, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1984
- BAZÎDÎ Mela Mehmûdê ,*Camîeya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (Amedekar Ziya Avci), Weşanên Lîs, Amed 2010
- BOÎS Thomas; *The Kurds*, Hayats, Beîrut, 1966
- BOZARSLAN Zekî ;*Nêrînek Li Dîroka Kurdistanê*, Weşanên Doz, Stenbol 2004
- ÇAKAR Mehmet Sait ve diğêrleri; *Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Weşanên Tarih vakfı, İstanbul 2010
- EL-AMEDÎ Zeynelabidîn; *Menzûmetan*, Diyarbakır Söz, 2002
- IZADY Mehrdad R. ;*Kürtler-Bir El Kitabı*, Weşanên Doz, Stenbol 2004
- JABA M.Alexandre ;*Recueil De Notices Et Récits Kourdes*, St.Petersburg 1860
- KAVAL Mûsa; *Keça Gavan û Kurê Mir*, Kovara Hêvî, Hejmar 4, 1985
- KAYA Zeynelabidin, M. Emîn NAROZÎ; *Melayê Cizîrî-Dîwan*, Weşanên Roja Nu, Stokholm/Swedan, 1987
- KERBELA Nevîn ;Muhîbbî ve “*Ma Yu ‘avvel ‘aleyh fi ‘l-Mûzafve ‘l-Muzaf İleyh*” Adlı Eseri,[http://turkoloji.cu.edu.tr/ESKI%20TURK%20%20EDEBIYATI/nevin\\_karabela\\_muhibbi.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/ESKI%20TURK%20%20EDEBIYATI/nevin_karabela_muhibbi.pdf)
- KHANAM R.;*Encyclopaedic Ethnography of Middle-East and Central Asia*, New Delhî, İndia, 2005 Volume1, A-I
- MÎNORSKY V.; Th. BOÎS; D. N. MC KENZİE ;*Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Doz, Stenbol, 2004
- REŞO Hemreş, “*Kronolojiya Nivîskarên Kurd li Kurdistana Bakûr*” Paris Kürt Enstitüsü, Kovara Hêviya Welêt, Paris 1976
- SADÎNÎ M. Xalid, *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2002
- SAGNÎÇ Feqî Huseyîn; *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1922
- QANATÊ Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Özge, Enqere, 1992
- TÛRAN Abdulbaqî ; *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010
- TÛRAN Abdulkadir; *Ümmetin Bir Azası Olarak Kürtlerde İslamî Kimliğin Gelişmesi*” Weşanên Dua, Stenbol 2011
- ÛZÛN Mehmed; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên İthakî, Stenbol 2011
- XANÎ Ehmedî ;(Türkçesi M.E.Bozarслан), *Mem û Zîn*, Weşanên Gün, Stenbol 1968
- XANÎ Ehmedê ; *Memozîn*, (Transkripsiyon Arif Zêrevan), Nefel, 2004
- VARLÎ, M. Ebdullah, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmed ê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanên Sîpan Yayın Evi, Ankara 2004
- YÛSUF Abdulreşîb; *Şairên Klasîk ên Kurd*, Weşanên Jîna Nû, Sweden, 1988
- ZEKÎ Mehmet Emîn ;*Kürt ve Kürdistan Ünlüleri (Meşahîr-î Kurd û Kurdistan)*, Weşanên Öz-Ge, Swedan 1998
- ZÎNAR Zeynelabidîn, *Nimûne: Ji Gencîneya Çanda Qedexkirî*, Weşanxane tune, Swedan, 1991